
Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî  Jimar :1226  1-Berfanbar-2024  www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Beşa Biyolojî di Zanîngeha Rojava de

Dîlan Mulhim/Qamişlo

**Mamosteyê beşa Biyolojî ya Zanîngeha Rojava Mihmed Şêx Mûsa dayir ku di sala 2016'an de ev beş hate vekirin, bi armanca ku xwendekar cihên xwe di nava saziyên Rêveberiya Xweser û hemû saziyên tendirustî û perwerdeyê de bigrin.**



Zanîngeha Rojava ku yek ji destkeftiyên şoreşa 19'ê Tîrmehê ye, ji bo xwendekarên hermê di sala 2016'an de hat damezrandin. Roj bi roj pêşket û niha bi sedan xwendekar di fakulte û beşên cuda yên zanîngehê de cihê xwe digrin. Yek ji beşên girîng yên zanîngehê jî beşê biyolojî ye ku dema xwendina wê çar sale.

Di derbarê beşa biyolojî ya Zaîngeha Rojava, mamosteyê beşa biyolojî Mihmed Şêx Mûsa ji rojnameya me re axavî.

### Avabûna beşê biolojîk

Mihmed Şêx Mûsa anî ziman ku beşê biyolojî cihê xwe di fakulteya Zanistê Xweza û Teknolojî de digire û wiha got: "Beşê biyolojî di 2016'an de bi avakirina zanîngehê, hate avakirin, di heman salê de xwendekar tevlî beşê biyolojî bûn. Herwiha heta niha 3 kom ji xwendekaran hatine derçûkirin. Salên xwendina vî beşî çarin. Beş bi giştî li ser metiryalên girêdayî şaneyên, lawiran, şînatî û zindiyên biçûk disekine. Bi giştî li ser gewdeyê mirov, şînatî û heyînên zindî tê dayîn. Armanc ji vakirina vî beşî ew e ku xwendekar piştî derçûna xwe cihên vala di saziyên Rêveberiya Xweser de dagirin û sûdên bidin civakê."

### Armanca beşa biyolojî


Şêx Mûsa axaftina xwe wiha domand: "Xwendekarên beşê biyolojî piştî derçûnê dikarin gelek cihê vala dagirin û gelek karan bikin. Herwiha xwendekarê derçûyî dikare karê mamostetiyê di dibistan, peymangeh û zanîngehan de cihê xwe bigrin. Di heman demê de dikare di kargehên xwarinên yan jî dermanan de dikare kar bikin. Pêwîstiya wan heye ji ber ku gelek metiryal derbasî Rojava dibin, divê werin lêkolînkirin û derçûnên vî beşî dikarin di vî warî de jî kar bikin, û hem dikarin di nexwşxaneyan û teqîgehan de jî kar bikin."

### Pirojeyên dema pêş

Mamosteyê beşa biolojî ya Zanîngeha Rojava Mihmed Şêx Mûsa axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Planên me ji bo vî beşî hene, xwendina bilind her sal di beş de tê vekirin. Herwiha kesê ku hate derçûnkirî dikarin xwendina master bixwînin, xwendina master sê beşên wê hene sosiyolojia bijîjkî, Heyînên zindî, biyotokolojî heye. Ev dema niha amede ne, di demên pêş de hîn planên din jî hene, em ê beşên di jî vekin. Di dema niha de di palanekê de kar dikin taqîgehên xwe xurtir bikin, îsal jî haziriyên teqîgehan bi rengekî baş hatiye kirin, heta ku xwendekar bi asteke baş biratîk bibin. Lê birastî astengî hene, lê ev zehmetî li ber çavane, ji ber ku Rojava bi giştî di dorpêçê de ye, bi taybet ji aliyê Bakur û Başûr ji ber ku amûrên em dixwazin bi zehmetî digihêjine me û hin pispor hene dixwazin ku werin Rojava ku semîneran bidin û cihê xwe di zanîngehê de bigirin zehmetî ji vî alî de jî hene. Em dixwazin ku hejmarekê ji xwendekaran derbiçin li gorî fikir û felsefeya netewa dîmkratîk derbiçin."



# Pirtûka "Dîroka Kurdistanê" bi Rûsî hat çapkirin




Li Rûsyayê pirtûka endamê Konseya Serokatiya Giştî ya KCK'ê Diyar Xerîb ya bi navê "Xwendinek nû ji bo dîroka Kurdistanê" bi zimanê rûsî hat çapkirin.
Otonomîya Federal ya Neteweyî û Çandî ya Kurdên Federasyona Rûsyayê pirtûka "Xwendinek nû ji bo dîroka Kurdistanê" ku di sala 2015'an de cara yekem hatiye çapkirin, li Rûsyayê bi navê "Dîroka Kurdistanê" çap kir. Pirtûk ji 367 rûpelan pêk tê. Pirtûk li Malên Kurdan ên Rûsyayê tên peydakirin.
Di pirtûkê de li ser pêkhatina gelê Kurd û Kurdistanê û ji serdema neolitîkê heta roja me ya îro, analîzeke kûr dike. Her wiha li ser tevgerên rizgarîxwaz ên ku bûne parçeyekî bingehîn ê dîroka Kurdistanê. Nivîskar di heman demê de perspektîfek nû li ser erdnîgarî û demografiya herêmê pêşkêş dike ku rê dide têgihîştina kûr a girîngiya wê di dîroka cîhanê de.
Di pirtûkê de behsa van mijaran dike:
Serdema neolîtîk: Civakên destpêkê yên Kurdistanê;
Damezrandina eşîrên Kurdan: Rola wan di serdema hiyerarşiyê û bazirganiya koleyan de;
Konfederasyona Medya: Zerdeştî û bandora wê li ser herêmê;
Serdema îslamî: Lihevhatina bi rastiyên nû yên olî û civakî;
Serdema kapîtalîzmê: Bandora faktorên derve li ser pêşketina herêmê;
Demên nûjen:Têkoşîna Kurdan ji bo çarenûsî û beşdarbûna wan di siyaseta navneteweyî de.

Sudoku: Bersiv 16

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 7 | 5 | 1 | 8 | 6 | 3 | 9 | 2 | 4 |
| 8 | 3 | 2 | 4 | 1 | 9 | 6 | 5 | 7 |
| 9 | 4 | 6 | 7 | 5 | 2 | 3 | 8 | 1 |
| 5 | 2 | 8 | 1 | 9 | 7 | 4 | 3 | 6 |
| 3 | 6 | 7 | 2 | 8 | 4 | 1 | 9 | 5 |
| 1 | 9 | 4 | 6 | 3 | 5 | 2 | 7 | 8 |
| 4 | 8 | 5 | 9 | 2 | 1 | 7 | 6 | 3 |
| 2 | 1 | 3 | 5 | 7 | 6 | 8 | 4 | 9 |
| 6 | 7 | 9 | 3 | 4 | 8 | 5 | 1 | 2 |

Sudoku:Pirs 17

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | 5 | | 4 | | 8 | | 3 | 7 |
| 8 | | | | 6 | | | | |
| | | 2 | | 7 | | | 5 | |
| | 8 | | | 2 | | 3 | | |
| | | | 3 | | 1 | | | |
| | | 7 | | 8 | | | 4 | |
| | 2 | | | 3 | | 8 | | |
| | | | | 5 | | | | 3 |
| 4 | 3 | | 1 | | 7 | | 2 | 6 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Bi gur re dikuje bi xwedî re şînê digire:**
- Bi heman wateyê.
**Deveyê bi çerm ve dixwe, dilê xwe bi mêşê diêşîne:**
- Di rastiyê de bêwijdan e, lê li ber çavan xwe qenc nîşan dide; durûtiyê dike.
Devê wî tiştekî dibêje, dilê wî tiştekî.
- Ne durist e; durû ye.
**Devê xwe guhert:**
- Gotina ji me re gotî pêk neanî; em xapandin; bi awayekî din axivî; tersê axftina xwe ya berê got.
**Devê xwe xwar kir:**
- Durûtî kir; ji yê hemberî xwe re xweş kir; rast negot.
**Dostê qûnê dijmine serî:**
- Ji bo kesên li ber çavan dost xuya dikin, lê ji dil ne rast tê gotin.
**Erê erê ne, tev jî kurê kerê ne:**
-Xweş dikin lê ne weke axaftinên xwe ne.
Firmêskan dibarîne, di bin **çavan re xwe dikenîne:**
- Durû ye; ne durist e; derewan dike.
**Hem bavê xwe dikuje, hem bi gora wî sond dixwe:**
- Hem zordestiyê lê dike, hem pesnê wî dide; durûtiyê dike.
**Liba nîskê ye, ne ber e ne pişt e:**
- Rast û çepê wî ne diyar in; durû ye; ne yê baweriyê ye.
**Li gorî axê lê dixe:**
- Şaloziyan dike; durû ye.
**Li pêş min zarxweş e, li pişt min zikreş e:**
- Durû ye; dijmin e.
**Li pêş min bav û bira ye, li pişt min dûpişka xirba ye:**
- Bi heman wateyê.

**Mîna guran goşt dixwe, mîna melekan xofê dikişîne:**
- Bi heman wateyê.
**Nanê sêlê ye:**
- Rast û çepên wî ne diyar in; bawerî pê nayê; durû ye.
**Serî dibêje Ella Ella, qûn dide mandela:**
- Ji bo kesê durû tê gotin.
**Ser cilê û bin cilê ye:**
- Durû ye; axaftinên wî hev nagirin.
**Zimanê wî hilûs e/zimanhilûs e/zimanê wî şahîk e:**
- Axaftinên wî xweş in.
- Melaqiyan dike; çawa ku ji mirov hes bike wisa diaxive, lê ne wisa ye; di axaftina xwe de ne durist e.
**Bi jehrê pengihaye:**
- Ji kînê tijî bûye.
**Birîna kevin axivî:**
- Dijminayî dîsa nû bû.
**Birîna kevin xwerand:**
- Dijminatî nû kir; behsa dijminatiya kevin kir.


Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

# Ahmet Turk: Li hemberî dizî û gendeliya qeyûman 'Berxwedan Jiyane'



Hevserokê Şaredariya bajarê mezin yê Mêrdînê Ahmet Turk da xuyakirin ku polîtîkaya qeyûman desteserkirina vîna gel e û wiha got "Di dijî desteserkirina şaredariyên gelê kurd tenê rêya çareseriyê berxwedan û têkoşîn e".**R-4**

# 'Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê bi dewleta Tirk re bazaran dike'




Rojnamevan Sînan Cûdî diyar kir ku Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê, li hemberî pergala işkence û qirkirinê ya Îmraliyê yek gotinê nake, li gorî berjewendiyên hêzên navneteweyî tevdigere û bi dewleta Tirk re jî di nava bazaran de ye.**R-6**

# Şîlan Kobanê, navnîşana eşqa azadî û berxwedaniyê ye



Şehîd Şîlan Kobanê ji yekemîn jinên kurd ên Rojava ku li dijî işkence û desthilatdariyê li ber xwe dide û parastina rêgezên xwe dike, lewra desthilatdarî ev yek qebûl nekir û di sala 2004'an de di kemînekê de Şîlan Kobanê tevî 4 hevalên wê hatin qetilkirin.**R-2**

# Pênûsa jinê hestên gel diherikîne



Helbestvan û rojnemevana jin Meryem Temir diyar kir ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê derfeteke pîroz da jinê da ku xebata xwe ya di warê rewşenbîrî de jî li pêş bixe û bikaribe hest û êşa gel binivîse.**R-7**



46 **Salî me!**
Ahmet Aktaş R-4



**Yekîtiya neteweyî tekane rêya xilasiya Sûriyê ye**
Idrîs Henan R-5

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî  Jimar : 1226  1-Berfanbar-2024  www.ronahi.net/ku/  Nirx: 500 L.S

# JI BO ÇARESERIYÊ XWEPARASTIN PÊWÎSTE

Şer û pirsgirêkên li Rojhilata Navîn ji rewş û pergala cîhanî bi giştî ne cûda ne. Şerên ku 5 hezar sal in li hemberî civakê tên meşandin, armanc jê kolekirina gelan e. Li hemberî van şeran, gel ji bo ku xwe biparêzin, hebûna xwe ewle bikin, ewlekarî û azadiya xwe misoger bikin, pêwîstî bi xweparastinê heye. Di demeke wiha de ku tevahiya Rojhilata Navîn û bi taybet Sûriyê di qonaxeke pir xeternak re derbas dibe, pêwîstiya gelan bi Şerê Gelê Şoreşgerî heye.**R-5**



# Zubeyde Zumrut: Mifteya aştiyê li Îmraliyê ye



Hevseroka KCDK-E Zubeyde Zumrut diyar kir ku ji bo çareserkirina pirsgirêka gelê kurd ji aliyê 300 kesayetên navdar ve deklerasyon hat destpêkirin û got, "Hemû cîhan dizane ku muxatabê pirsgirêka kurd Rêber Apo ye, ji bo ku pirsgirêka kurd bê çareserkirin pêwîste azadiya fîzîkî a Rêber Apo pêk were."**R-3**

# Şîlan Kobanê, navnîşana eşqa azadî û berxwedaniyê ye

Şehîd Şîlan Kobanê ji yekemîn jinên kurd ên Rojava ku li dijî işkence û desthilatdariyê li ber xwe dide û parastina rêgezên xwe dike, lewra desthilatdarî ev yek qebûl nekir û di sala 2004'an de di kemînekê de Şîlan Kobanê tevî 4 hevalên wê hatin qetilkirin.

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Têkoşer Meysa Baqî "Şîlan Kobanê" di sala 1971'an de li gundê Kor Elî yê ku 25 km dikeve Rojavayê bajarê Kobanê ji dayik bû. Şîlan di nava hawîrdoreke ku kevneşopiyên eşîrtî lê serwer e mezin bû. Malbata wê ji dayik, bav, 5 keç û 4 xortan pêk tê û di dawiya salên 1970'î de ji bo kar û xebatê berê xwe dane bajarê Helebê. Şîlan di 9 saliyê de, di sala 1980'î de, Tevgera Azadiya Kurdistanê nas dike, bi kesayeta Rêber Abdullah Ocalan û fikirê wî ve tê girêdan û hêvî dike ku bibe têkoşerek. Malbata şehîd Şîlan beriya PKK'ê nas bike bi tu partiyên siyasî yên Kurd ve têkildar nebûne. Lê belê rihê welatperweriyê jiyane. Rastiya mêtingerî û siyasetên wê yên asîmîlasyonê yên li dijî kurdan baş nas dikir, parastina zimanê xwe kir û ji yekemîn malbatên li Sûriyê alîgiriya PKK'ê kirine.

### Ez evîndarê Kurdistan û azadiyê bibim û peyde biçûma


Di sala 1982'an de, dema şehîd Şîlan di 11 saliya xwe de bû, Rêber Abdullah Ocalan serdana mala wan dike, ew cara yekemîn e wî dibîne û nas dike. Şîlan derbarê vê rojê de wiha gotibû: "Ew kêliya herî bi wate ye di jiyana min de bû. Piştî wê rojê min fêm kir ku wê êdî jiyana min weke berê dewam neke. Ezê evîndarê Kurdistan û azadiyê bibim û ez ê peyde biçûma"

### Gireva li dijî xwendinê

Dema şehîd Şîlan di refa seretayî de dixwîne astengiyeke mezin dikişîne, ji ber ku bi zimanê erebî baş nizane û dûrî çanda wê ye, lê bi israra wê ya li ser xwendinê tê de bi ser dikeve. Li Helebê têkoşer Şîlan tevlî çalakiyên hunerî bû û wê demê tevî hevalên xwe koma Agirî ya hunerî ava dike û yekemîn alboma xwe ya hunerî ku şerê gerîla dest pê kir, derdixîne. Di alboma xwe de eşqa xwe ya bêhempa ji tifinga gerîla re nîşan dide. Dema Şîlan û hevrêyên wê ji bo beşdariya pîrozbahiyên Newrozê tên qedexekirin cara yekemîn li dijî dibistana xwe isyanê dike. Di encamê de Şîlan û hevalên xwe, berxwedana nû bi navê "gireva li dijî xwendinê" li dar dixin. Lê ji ber helwesta xwe ya siyasî ji aliyê desthilatên Sûriyê ve tê girtin. Şîlan ji jinên yekemîn e yên li dijî desthilatên Sûriyê isyan kir û li dijî îşkenceyê li ber xwe da.

### Şîlan xwediya parastina rêgezên kurdewariyê bû

Şehîd Şîlan 5 rojan di Girtîgeha Navendî ya Helebê şaxê ewlehiya siyasî ya girêdayî hikumeta Şamê de dimîne û wê demê Şîlan ji yekemîn jinên Kurd ên Rojava ku li dijî îşkenceyê li ber xwe dide û parastina rêgezên xwe dike. Her wiha ji desthilata serwer re îsbat



kir ku jina Kurd nayê çewisandin, siyasetê dizane, dikare rêvebertî û pêşengtiyê bike.

### Şehîd Şîlan ji bo çûna qada şer bi israr bû

Şîlan Kobanê piştî xwendina xwe ya qonaxa navîn temam dike, di Tebaxa 1988'an de li Helebê tevlî têkoşîna Tevgera Azadiya Kurdistanê dibe û tevî 4 hevalên keç berê xwe didin Lubnanê, li dergehê sînor ê Sûriyê û Lubnanê ji hêla desthilatên Lubnanê ve tên sekinandin. 2 mehan di girtîgeha jinan de dimîne û li wir jiyana civakî nas dike. Dûvre şehîd Şîlan Kobanê tevlî Akademiya Şehîd Mahsûm Korkmaz a li Lubnanê dibe, li wir perwerdeyên leşkerî û siyasî dibîne û têkoşîna xwe bi navê "Seadat" dest pê dike û piştre navê Şîlan li xwe dike. Tevî israra şehîd Şîlan a çûna qadên şer ku li gel hevalên xwe şer bike, lê piştî perwerdeyê ji bo çalakiyên rêxistinî li Lubnanê tê erkdarkirin. Her wiha piştî şopandina xebatên rêxistinî li Lubnanê, careke din di 1989'an de vedigere Akademiya Şehîd Mahsûm Korkmaz.

### Şîlan çavkaniya hêz û coşê bû

Şîlan Kobanê di Buhara 1995'an de berê xwe dide çiyayên Kurdistanê. Dema 1'emîn Kongreya Yekîtiya Azadiya Jinên Kurdistanê (YAJK) li herêma Metîna ya çiyayên Kurdistanê li dar dikeve. Ew civîna yekemîn a giştî bû ku nûnertiya jinên Kurdistanê li çiyayên Kurdistanê dike û bi rêya wê jinên azad ên Kurdistanê xwe bi xwe bi rê ve dibin. Di kongreyê de Şîlan weke endama Komîteya Navendî hat hilbijartin û li ayaleta Zagrosê berpirsa yekîneyên jinên azad hat erkdarkirin. Dema yekîneyên leşkerî yên jinan wek tûgayan hatin avakirin, ev erka leşkerî ji şehîd Şîlan Kobanê re hat dayîn. Di şertên herî zehmet de, bi sekna xwe ya rast, bû çavkaniya hêz û coşê ji bona hemû hevalên xwe.

### Şîlan têkoşera Kurdistanî ye

Di sala 1997'an de Şîlan derbasî bajarê Silêmaniyê yê Başûrê Kurdistanê dibe û dest bi xebatên rêxistinî dike. Di sala 1999'an de jî Şîlanê cihê xwe di rêveberiya Partiya Azadiya Jinên Kurdistanê de digire. Bi lidarxistina kongreya PYD'ê ya 2003`yan re wek Endama desteya rêveber a partiyê hate hilbijartin. Piştre berê xwe da Rojava da ku beşdarî çalakiyên rêxistinî bibe. Şîlan Kobanê xebata xwe li Rojava didomîne, beşdarî tevahî çalakiyên rêxistinî dibe û gelek gav di qadên rêxistinî û pratîkî de avêtin. Lê di demeke kurt de ji îstîxbarata Sûriyê re agahî hatin ku Şîlan Kobanê li Rojava ye.

### Armac dikirin pêşiya şoreşa Rojava bigrin

Dema ku Şîlan kar û xebatên di navbera Iraq û Sûriyê dikir, di 29'ê Mijdara 2004'an û di encama kemîneke hevbeş ya Rejîma BAAS'ê û dewleta tirk de bi hevalên xwe Zekeriya, Ciwan, Fûad û Cemîl re li bajarê Mûsilê hat armanckirin û şehîdxistin. Lê bi şehîdxistina Şîlanê re jî nekarîn pêşiya şoreşa Rojava bigrin.

### Li pey eşqa azadiyê berxwedan didome

Şîlan Kobanî ne tenê ji bo xwe, ji bo tevahî jinan mîras û hêviyeke şoreşê li pey xwe hişt û bedela xwe li ser navê hemû jinan da. Ji lewra ger şoreşa Rojava îro li tevahî cîhanê gav bi gav deng vedide û dibe navê hêviyan, ji ber di havênê wê de Şîlan Kobanê heye. Li Rojava"firîşteyên welatê bihûştê" bi navê Şîlan li pey eşqa azadiyê berxwedan didome û wê bidome.

# 'Aboriya civakî li hemberî aboriya kapîtalîst alternatîf e'

**Hevseroka Buroyên Koperatîfan Cîhan Alo anî ziman ku aboriya civakî li hemberî aboriya kapîtalîst ku xwe dispêre mêtîngeriya li ser keda civakê alternatîf e û destnîşan kir ku ew dixwqazin aboriyekê ku gel têra xwe bike pêş bixin.**

Paradîgmaya modernîteya demokratîk a Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, aboriya civakî ku civak ji bo xwe têra xwe bike weke alternatîfa aboriya kapîtalîst pêşniyar dike. Kapîtalîzlm bi cezakirina mirovan û çêkirina şer û qeyranên aborî armanc dike ku qezenca herî bilind bi dest bixe. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bingehê aboriya civakî ye ku civak bikaribe pêdiviya xwe tê de peyda bike. Bi aboriya ku bi piranî bi koperatîfan



tê organîzekirin, rêyek xweser a ku ne girêdayî çavkaniyên derve ye tê şopandin. Hevseroka Buroya Koperatîfan a Komîteya Aboriya Civakî ya Kantona Minbicê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Cîhan Alo xebatên wan nirxand.

Cîhan AlO diyar kir ku kapîtalîzlm, aborî nîn e, dijberî wê dijminê aboriyê ye û got ku kapîtalîzlm bihayên bazaran kontrol dike, yekdestdariyê ava dike û hewl dide berjewendiyan bi dest bixe. Cîhan Alo got ku ev pergal ne ya karkeran a xwediyên razemeniyan e, xwe dispêre berjewendiyên şexsî. Her wiha diyar kir ku kapîtalîzlm, bi krîzên aborî û xizaniyê berê civakê dide madiyatperestiyê.

### Prensîbên xebata aboriya civakî

Cîhan Alo modêla aboriya civakî ya neteweya demokratîk weke; hevkariya aborî ya li ser bingeha edalet û wekheviyê hilberînê dike pênase kir û got ku ev modêl di nava xwe de azadiya jinan dihewîne û xwedî armanca parastina hawîrdorê ye. Cîhan Alo got: "Dahata ji aboriyê bi awayê adil parve dike û piştgirî dide ku jin di hemû waran de bi awayê herî çalak bixebitin. Aboriya civakî, di bingeh de xwe dispêre xebata hevpar a mirovan û ji bo pêşerojê li ser riyên debarê planan çêdike."

### Rol û serkeftinên koperatîfan

Cîha Alo diyar kir ku koperatîf, bingeha aboriya civakî ya bi rêbazên demokratîk hatiye avakirin e, teşwîqê hilberîna ku zirarê nade derdor û xwezayê dike, piştgiriyê dide qadên weke perwerde, tendirustî û parastinê. Her wiha diyar kir ku di koperatîfan de li cihê belavkirina mehaneyan, li gorî rêjeya hilberînê û dahata mehane parvekirin çêdibe û got: "Di navbera projeyên mînak de; 146 firinên nan, aşekê ku 90 kes cihê xwe di nava hilberîna wê de digrin; dermanxaneya çandiniyê ya ku 60 kes têde beşdar bûne, depoyeke xurekê ya 24 beşdarên wê hene û projeyên weke xwdîkirina mirîşkan, ajalkarî, hilberîna alif hene. Di navbera planên me yên ji bo pêşerojê de jî koperatîfa kelûpelên avahiyan, cihê şûştina wesayîdan û dermanxaneya veterîner heye."

### Aboriya civakî alternatîfa li dijî kapîtalîzmê ye

Cîhan Alo, bal kişand ser aboriya civakî ya xwe dispêre koperatîfan, ku dawî li aboriya kapîtalîst aniye û ketiye pêşiya wê û wiha bi dawî kir: "Ev modêla aborî, derfet dide ku civak bi xwe aboriya xwe bi rêve bibe û bi saya vê yekê têrkirina xwe tê armanckirin. Aboriya civakî, yek ji rêbazên pejirandina modêla neteweya demokratîk a li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye." **NÛ JINHA**



# 'Xebata rewşenbîrên ciwan, agirê dilê kurdan û wêjeya kurdî venamirîne'

Nivîskar Ebûd Mexso da zanîn ku piştî Şoreşa Rojava ciwanan xebateke wêjeyî kir, lê ev xebat kela dilê kurdan û wêjeya kurdî venamirîne û wiha bang kir: "Pêwîste saziyên rewşenbîrî destekê bidin ciwanan û ciwan jî xwedî li wêjeya kurdî derkevin."

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Pirsa asta wêjeyê li cem ciwanên kurd li rojava gelekî girîng e. Mijarên wekî wêje û hestên rewşenbîr û nivîskarên nûhatî ji bo pêşeroja wêjeya hin mijarên stûnî ne, nexasim wêjeya kurdî. Derbarê heman mijarê de Hevserokê Yekîtiya Rewşenbîran a kantona Cizîrê, Ebûd Mexso bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn jî wiha bû:

**Bi destpêkirina Şoreşa 19'ê Tîrmehê re, derfetek ji bo parastin û pêşxistina wêjeya kurdî çêbû, gelo ciwanên kurd bi erkê xwe ji bo vê mijara girîng, rabûn?**

Ji bo mijara wêjeya kurdî li Rojavayê Kurdistanê, em dikarin bibêjin ku derbasî sê qonaxan bûye. Wêjeya me ya kevnar jî bi destê kesên biyanî hatiye nivîsîn û ji destpêka çerxê derbasbûyî nivîskarên me nêzî wêjeyê bûne. Qonaxa destpêkê ji sala 1900'î hetanî salên 1980'î ye. Qonaxa duyan di navbera salên 1980'î û 2011'an de bû û qonaxa 3'yan jî piştî Şoreşa Rojava dest pê kir. Wekî em dizanin ji ber kêmderfetiyê, nivîskaên beriya şoreşê pir kêm bûn û li ser tiliyên destan dihatin jimartin. Bi destpêkirina Şoreşa Rojava re jî derfetên mezin ji bo kurdan çêbû, bi taybet jî di warê wêje û nivîsandinê de. Di pêşwextiya şoreşê de em li malan digeriyan da ku mamosteyan ji bo ku li di-



bistana tenê tîpan bidin şagirtan. Berî çêbûna van derfetan, ez yek ji wan kesan bûm ku min bi riya pirtûkên Cegerxwîn, xwe fêrî tîpên kurdî kir. Lê îro dibistan, zanîngeh, saziyên çandî û rewşenbîrî hene, eger em bipisin ku ciwanan di warê wêjeyê de xwedî erk û rol bûn, dê bibêjin ku heya astekê baş bûn. Em dizanin ku hin kesên ciwan xwe di warê çandî û wêjeyî de pêş xistin, lê gelo li gorî hêviyên şoreşê û derfetên roja îro, bûn? Na ciwan nebûn xwedî rola herî baş û serkeftî di warê wêje û nivîsandinê de. Xebata wêjeyî ya ciwanan, kela dilê gelê kurd, wêjeya kurdî û şoreşê hênik nake. Ne tenê ciwanên me kêm man, lê belê kesên mezin jî hîna erka xwe pêk neanîne.

**Hûn asta wêjeyê û berhemên ciwanan li Rojavayê Kurdistanê çawa dinerxînin?**

Di dema heyî de em dibînin ku mehrecan û gelek cureyên çalakiyên wêjeyî û çandî tên lidarxitstin. Pênûsa ciwanan, derbirîn û hestên wan tên xuyakirin. Mînak beşdarbûna ciwana di qada mehrecana helbestê de ya ku berî çend mehan li darket. Me dît ku berhemên ciwanan xelata yekem derketin, ev yek jî cihê serbilindahiyê ye. Ciwanên me yên ku mijûlî wêjeyê dibin xwedî derfet in, asta nivîs û helbestên wan jî heya astekê baş in, lê hejmara ciwanên ku nêzî wêjeyê dibin kêm in. Di dema heyî de hin ciwan ketine nav qada wêjeyê û mijûlî helbestê bûne, mîna Dilyar Hebîb, Aras Qasim, Dilyar Osê û Diyala Elî ye. Di festîvala Rojava ya Çand û Hunerê de roja helbestên ciwanan hate li darxistin û van helbestvanên me yên nûhatî, helbestên xwe xwendin. Me tevan dît ku çawa bi dilşewatî û hestên xwe yên keliyayî helbest ji aliyê ciwanan ve dihatin xwendin. Van ciwanên ku bi ser tiliyên destan tên jimartin, xwe di warê wêjeyê de li pêş xistine û derbirînên xwe ji me re didin diyarkirin. Em nikarin bibêjin ku ji wêjeya kurdî re bûne pêşeng di dema heyî de, lê belê bingehek ji siberoja wêjeyê re ava kirine. Mixabin dema ku hin kesên ciwan gavan davêjin ber bi wêjeyê ve diavêjin, hin nivîskarên me yên bi temenê xwe mezin li dijî hin nivîskarên nûhatî radibin. Dema ku ciwanek di pêşbirkên mîna pêşbirkên helbestê de bi ser ketin, helbestvanên me rexne kirin ku berhemên wan hêja bûn, ji ber ku asta helbestê ji asta helbestên ciwanan bilind bû û helbestvanên temen mezin xwediyên kedê ne. Lê di pêşbirkê de qomîteyeke nirxandinê hebû û li ser wê pêvajoyê nirxandin hat kirin.



**Sedemên ku dihêle ciwan dûrî wêjeya kurdî bikevin çi ne, hetanî ku di siberojê de ciwan nêzî wêjeyê bibin û pêşxistinê tê de biafrînin, erka saziyên rewşenbîrî, ciwan û Rêveberiya Xweser tê xwestin?**


Rojavayê Kurdistanê di zehmetiyekê re derbas dibe, tevlîhevî û bêaramî ji ber êrişan heye, rewşa Rojhilata Navîn tevî wiha ye, herêma me jî wiha ye. Ji ber rewşa heyî em di nav kirîzeke wêjeyî, civakî, siyasî û aborî de jiyan dikin. Ciwan jî dikevin bin bandora rewşa tevlîhev de. Gelo ji ber jiyana rojane, derfet heye ku ciwanên me nêzî nivîsê bibin, gelo aramî dikeve dilê wan de ku mijûlî wêjeyê bibin. Di heman demê de em dibînin ku şerekî taybet bi riya madeyên hişbir, karên bêexlaqî û hwd… li ser ciwanên me tê meşandin. Dighêje asta ku ji dijmin re tên bikaranîn û dibin çavdêr. Tişta ku tê xwestin ew e ku ciwanên me bi vîn û hêz bin li hember vî şerî û li gorî hêviya şoreşê gavan bi pêş de bavêjin. Herwiha pêwîste Rêveberiya Xweser xwedî li saziyên rewşenbîrî derkeve û ev sazî jî bibin destek ji ciwanan re. Li aliyekî din divê rewşenbîrên me alîkariya ciwanên ku nêzî wêjeyê û nivîsê dibe, bikin. Pêwîste rewşenbîr ciwanan neşkînin, lê belê rêbazên nivîsê ji wan re bidin xuyakirin û ciwanan fêr bikin. Di dema heyî de derfeta me heye ku em nifşên nû ava bikin, mînak em rê û rêçên nivîsîna helbestê ji ciwanan re bidin şîrovekirin. Herwiha ji ber ku bilindibûn asta wêjeyê bi ciwanan e, ev ciwanên me yên nivîskar ku gavên berbiçav avêtine pêwîste xebata xwe bidomînin. Hem jî divê bi sedan ciwan cihê xwe di nava wêjeyê de bigirin û bibin pêşengê wêjeyê. Ji ber ku roj roja ciwanan e, serkeftina wêjeyê û pêşketina wê bi ciwanan pêkan dibe.

# Pênûsa jinê hestên gel diherikîne

**Berçem Silêman/ Qamişlo**

**Helbestvan û rojnemevana jin Meryem Temir diyar kir ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê derfeteke pîroz da jinê da ku xebata xwe ya di warê rewşenbîrî de jî li pêş bixe û bikaribe hest û êşa gel binivîse.**

Piştî Şoreşa 19'ê Tîrmehê xebatê jina rewşenbîr dest pê kir. Jinê karîbû roleke girîng bilîze di gelek qadan de. Rola wê gelek çalak bû û bi encam bû, lê li gor derfetên heyî pêwîst bû jin gavên mezintir avêtiban. Ji ber ku şoreş bi şoreşa jinê tê naskirin û rol û misyona jinê bi taybet ya kurd pêwîste deha zêdetir xurt be û bi wate be.
Di derbar xebata jinê di warê



rewşenbîriyê de, helbestvan û rojnemevana jin Meryem Temir ji Rojnameya me re axivî.

### Rola jinê di nivîsê de

Meryem Temir da zanîn ku jinê li Rojavayê Kurdistanê cihê xwe di gelek qadan de girt wekî; rêveberî, siyasî, ragihandin, hwrwiha bi pînûsa xwe jî bû pîşeng û wiha domand: "Lê xwesteka me ew bû ku jin roleke mezintir bilîze, ji ber ku giranbûna barê ku jin rahiştiyê de, divê xebatê wê jî deha zêdetir be. Di warê wêjeyî de jinê berê xwe da nivîsê û xwest bi riya pênûsa xwe hemû hest û êşa derdorê binvîsine. Karî gavên pîroz bavêje û di heman demê de bi saya fikir û ramanên Rêber Apo jinê karî derkeve pêşberî gel û hestên xwe bîne ziman. Girîngiya xebata jinê di sazî, dezgehên wêjeyî, çandî û perwerdeyî de derket, bi pirbûna saziyên rewşenbîr li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê hewcedar bû ku jin jî tevlî bibe da ku derdor hêza xwe ji hestên wê bigre. Qelsbûna ku di vê warî de derdike sedema wê rewşenbîr bixwe ye, ji ber ku em hewcedarî hin kesane ku him asta nivîsê him jî şêwazên cûda li cem wan hebin, da ku bi riya nivîsê re sûdekî bide derdorê."

### Destekdayîna jina rewşenbîr

Helbestvan û rojnemevanan jin Meryem Temir dawî li axaftinên xwe anîn û wiha got: "Mirov dikare bêje dema qelsbûn derdikeve carnan sedemê wê nerêxistinbûyîne, ev yek him di kesayet him jî di saziyan de ye derdikeve. Ew qeyd û bendên ku civakê ji jinê re danîbûn raste ji kokê de ne hatine şikandin lê heta astekî jinê kariye bi riya îradeya xwe gelek guhertinên ber biçav çêbike. Ev gavên ku jinê îro roj avêtî hemû bi saya Şoreşa 19'ê Tîrmehê ye, ji ber ku ev gavên ku niha tên avêtin berî 10 salan jinê nedikarî bavêje û qeydan bişkîne. Heya ku jin bikaribe hemû kêmasî û astengiyên ku rastî wê tê derbas bike, pêwîste alîkarî hebê ev alîkarî ji hêla Rêveberiya Xweser, ji saziyên rewşenbîrî yên ku di nava Rêveberiya Xweser de kar dikin, yekîtiyên nivîskaran yên ku jinên rewşenbîr endamên wane. Pêwîste jin vê derfetê ji dest xwe nebe û karê rewşenbîriyê bêtir bigre ser milê xwe. Jin divê hin wext bide nivîsê jî ji ber ku hertim afrandina nûbûnê li cem jinê heye. Erkê herî mezin divê sazî destekê bidin jinan û rê negrin li pêşya wan li ser asta cîhanê."

# ‘Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê bi dewleta Tirk re bazaran dike’

Rojnamevan Sînan Cûdî diyar kir ku Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê, li hemberî pergala işkence û qirkirinê ya Îmraliyê yek gotinê nake, li gorî berjewendiyên hêzên navneteweyî tevdigere û bi dewleta Tirk re jî di nava bazaran de ye.

**Tekoşîn Amara/Qamişlo**



Di derbarê pergala îşkence û qirkirina ku li Îmraliyê de tê meşandin, rojnamevan Sînan Cûdî bersiva pirsê Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**-Ev 26 sal in ku siyaseta qirkirin û îşkencê li îmraliyê tê meşandin, hedefa dewleta tirk ji vî siyasetê çi ye?**

Rêber Apo, di paraznamêyên xwe de pêvajoya kompLoyê bi berfirehî nirxandiye. Aliyên beşdar û rewşên bûne sedemê kompLoyê bi hemû hûrgiliyên wê raxistiye ber çavan. Bi taybet di Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk de plansazîyên nîzama navnetewî û rola dewleta tirk di wan pilanan de pir berfireh dibêje. Ji bo em bikaribin sîstema êşkenceya îmralîyê ya 26 salan serwext bin û têbigihijin, bêguman divê van pilanan û girîngiya Rêber Apo bizanibin.

Rêber Apo dibêje, “Pêvajoya kompLoyê ji serî heta dawiyê ji aliyê Îsraîl-DYA-YE û Rûsyaya Sovyet a perçebûyî ve hat afirandin. Rola Hikûmetên Sûriye, Yewnanîstan û Tirkiyeyê di kompLoyê de nikare ji xizmetên burokratîk ên destê duyemîn derkeve.” yanî esas de pêkanîn û meşandina kompLoyê ji destê dewletên navnetewî çêdibe. Ji xwe dema Rêbertî dibin girtîgeha îmraliyê jî ev rewş eşkeretir dibe. Rêber Apo ji bo wê kelîyê wiha digot; “Dema ez birim Girtîgeha Îmraliyê, kesê yekem ku silav da min nûnerê serokatiya Komîteya Pêşîgirtina li Êşkenceyê ya girêdayî Konseya Ewropayê bû. Tişta ewil got, “Hûn ê li vê girtîgehê bimînin, em ê bi rêya Konseya Ewropayê çavdêriya wê bikin û hewl bidin ku hin çareseriyan pêş bixin.”

Ev tê çi wateyê? Tê wateya ku komplo û sîstema êşkenceyê Îmralîyê ne tenê di destê dewleta tirk de ye. Ji xwe serok hikûmetê dewleta dagirker a tirk a wê demê Bûlend Ecevît jî gotibû, “ez nizanim Apo çima radestî me kirin”.

Bêguman DYA, YE û dewleta tirk bi heman armancê tevdigerin. Nîzama sedsala 20’emîn li ser tinebûna kurdan hatibû saz kirin û van hêzan ev sed sal in dixwazin heman nîzame bidin berdewam kirin. Lê têkoşîna tevgera azadiyê kurdistanê hemû pilanê van hêzan xirakir. Di şexsê Rêber Apo de Kurdê Azad xwe bi rêxistin kir û hemû cîhanê re nîşan kir ku bê Kurd nikarin li vê herêmê tevbigerin. Lewma li dijî Rêbertî tol standinekî mijarê gotinê ye. Ne rejîmên klasîk ên sultayî yên ji serdemê navîn mane û ne jî dewlet netewên wekê berdewamîyê wan in nikaribûn vê pêşketinê xwe ragirtibana. Bi ferd û civakê xwe re Kurdê azad hemû jiberê wan xiradikir. Ji ber ku hem bîrdozîyên fetihkar ên îslamî û hem jî bîrdozîyên nijadperêst ên lîberalîzmê kurdê azad ji defterê xwe mehandibûn. Ê ku di şexsê Rêber Apo de dihat hedefgirtin û mahkum kirin di eslê xwe de gelê kurd bû.

Ger hîna jî di girtîgeha îmralîyê de tecrîd û êşkenceyekî girankirî bi vê awayî berdewam dike, sedemê esasî ev e.

**Dewleta Tirk gelek mafên hiquûqî û mirovî bin pê dike, yek jê mafê hêviyê ye, di heman demê de qedexekirina hevdîtana bi parêzer û malbatê re, hûn vî çawa dinirxînin?**

Rêber Apo rewşa xwe ya li îmralîyê weke rehînbûn bi nav kir. Wekê tê zanîn rehîn ji wan kesên ku ji bo bicîhanîna peyman an daxwazek tê girtin re tê gotin. Mafên wan ên hiqûqî tûne ne. Ji ber rewşekî wan a hiqûqî nîne. Sedemên girtinê jî sîyasî ye, rewşa wî ya di girtîgehê de jî bi vê şeklî ye. Ango ji bo berxwedana gelên me bişkînin û hemû hêzên xwe teslîmî dijminên xwe bikin, Rêber Apo wekê rehîn bi kar tînin.

Lewma divê binpêkirinên hiqûqî jî wekê perçekî ji armancên sîyasî ya tirkan û hêzên li pişt wî ne bibînin. Çima wekê Rêber û nûnerê gelekî nabînin? Çima wekê kesayetekî hiqûqî nabînin û mafên bingehîn a mirovî li ser Rêber Apo pêk naynin? Ji ber ku nêzîkatîya Rêber Apo nêzîkatîya gelê kurd e. Ger ev sed sal in gelê kurd tune tê hesibandin û nîzam li gorî vê hatibe avakirin, ne dûr e ku Rêber Apo jî bi vê şeklî nebînin.


Em di nava şerê cihanê ya sêyemîn de ne. Ango hemû dewletên navnetewî û herêmî hewldidin di nexşeya nû ya Rojhilatanavîn de li gorî berjewendîyên xwe nîzamekî biafirînin. Lê naxwazin ev nîzam bingehên esasî ya di şerê cihanê duyemîn de avetine xira bike. Lewma divê tifaqiyê wan a li ser tune hesibandina kurdan hatiye ava kirin berdewam bike.

Dixwazin ku kurd di xizmeta wan de bin, ne ji bo xwe, lê ji bo berjewendîya hêzên kûrewî bijîn û têbikoşin. Ji ber ku Rêber Apo vê ferasetê erê nake û îrade û vîna kurdan di pêşengtiya PKK de misoger kir û di heman demê de di nexşeyên sîyasî ya cihanî de pirsgirêka kurd xuyanîtir kir tê asteng kirin. Naxwazin Rêber Apo biaxive, naxwazin perspektifan ava bike. Ji ber bi axaftinekî dikare bi mîlyonan bandor bike naxwazin ew biaxive û sîyasetê bimeşîne. Rêber Apo bi xwe dibêje min heftekî bihêlin ezê hemû pirsgirêkên şer çareser bikim.

Ger şer bisekine wê çi be? Bêguman mesleheta hemû hêzên kûrewî û herêmî asteng bibin. Hemû gelên ku tê xapandin dikarin ji rewşê agahdar bin û li pêşîyê polîtîkayên hêzên dagirker rabin tekoşînê bikin.

Ji ber van sedeman nahêlin Rêber Apo yek ji mafên bingehîn a mirovahîyê jî feyde bibîne.



**Gelê ku îro li tevahî cîhanê bi çalakî û bertekên xwe çi bersivê dide dewleta Tirk û dewletên ku destên wan di vî komploy de heye?**

Bêguman di serî de jin û ciwanan, hemû gelên herêmê û cihanê wateya kompLoyê baş dizanin. Rêber apo, ne tenê wekê serokê gelekî yan partîyekî ye. Rêber Apo bûye hêvîyê hemû gelan. Gelê kurd lewma bi Rêber Apo ve ewqas girêdayî ye. Ji ber profîla Rêbere kî cuda dest nîşan dike. Jiyana wî bi temamî ji bo berjewendiya gelê kurd hatiya hûnandin. Û ev 26 sal in ger dikare li hemberî hemû êşkence û zaxtan berxwe bide, ji xetê xwe mîlîmekî jî paş ve neçe, ev girêdana wî bi doza xwe re destnîşan dike. Di dîroka kurdan de Rêber û pêşengekî bi vî şeklî derneketiye. Lewma gelê kurd zêdetir xwedî derdikeve. Hebûn û tendûristiya wî wekê hebûna xwe dibîne. Hêvî û bawerîyê xwe tenê di wî de dibîne. Lewma bi eşqekî mezin, bê rawestan azadîya Rêber Apo dixwazin û ji bo vê têdikoşin. Ji xwe ev asta çalakîyê ev 26 sal in qet nesekiniye. Ji bersivdayina destpêke ya kompLoya 9’ê cotmehê vir ve ev çand berdewam e. çalakîyên hûn “nikarin roja me tarî bikin” û vir ve gelê kurd ev 26 sal in li ser lingan in. ger mirov hebûna xwe bi tiştekî ve girêbide bêguman ji bo wê her tiştî jî dide ber çavan û bi coşekî mezin dikare ew daxwaza xwe jî serbixe.

**Ji bo azadiya fizîkî ya Rêber Apo çi erk dikeve ser milên saziyên hiqûqî û mirovî yên navnetewî çine?**

beriye her tiştî divê rastiya Rêber Apo baş bizanibin. Ger dixwazin bêhiqûqîye heyî tehlîl bikin, divê sedemên girtin û sîstema îmralîyê çima hatiya danîn divê baş bizanibin. Ji bo vê jî berîye her tiştî divê nîzama kapîtalîzmê, modernîteya kapîtalîzmê baş were analîzkirin. Nêrîn û pêşnîyarên Rêber Apo ya li hemberî pirsgirêkên civakî daniye jî divê baş bê zanîn. Rêbertî di paraznamêyê xwe ya bi navê Parastina Gelekî de vê baş anîbû ziman, digot, “ger dixwazin yekî biparêzin divê pêşîye bizanibin xwe çawa biparêzin”. Sîstemê di nav de jiyan dikin çi ye, çi bandor li ser wan kiriye çi ye divê bizanibin. Avahiya zêhnî çawa hatiye hûnandin, kapîtalîzm civakan anîye çi halî û çiqas ji exlaq bê par hiştiye divê his bikin û bizanibin.

Heta van dahurandinan nekin, nikaribin li hemberî sîstema kapîtalîzmê ku hemû civakan xistiye nava qefesekî hesinî de rast têbigihijin. Lîstok û xapandinên hatinê danîn nikarin fêm bikin. Bêhiqûqiyên heyî jî nikarin baş tehlîl bikin.

Ger van hemûyan tehlîl bikin, hingî dikarin têkoşînekî encamgir bimeşînin. Ev têkoşîn jî divê ji kok û cewher be. Ango ne di sînorên hiqûqa heyî de têbikoşin, ji bo hejandin û hilweşandina hiqûqa heyî divê têkoşîn bê danîn. Ji ber ku hiqûqa navnetewî de mafê gelê kurd û nûnerê wê ya herî li pêş, mafê Rêber Apo tune ye. Mafên gelên bindest, jinan, kêmnetewan û hemû kesên mexdur tune ye. Yanî bi kurtasî tekoşînekî hiqûqî ya bê meşandin ji bo avakirina hiqûkekî adîl be. Ji bo civaka exlaqî û polîtîk be. Ji ber ku di hiqûqa heyî de valatî û xapandin zehf e. dozên Rêber Apo yên heyî jî vê eşkere dike. Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê, tecrîda li ser Rêber Apo gotin nake. Rixmê ku dibêjin dadgehkirin ne adîl e, lê ji bo dadgehkirinekî adîl ked nade. Hemû tekîlîyên xwe dispêre berjewendiyê dewletên netewe. Bi dewleta tirk re jî li ser van esasan bazariyan dikin.

Lewma erkê serekê ya ku dikeve li ser milên sazî û dezgehên hiqûqî û mirovî ewê ku, rexne li vê hiqûqê bikin û dewsa wê de hiqûqekî ku mafên gelê kurd û Rêber Apo misoger dike biafirînin.



# Zubeyde Zumrut: Mifteya aştiyê li Îmraliyê ye

Hevseroka KCDK-E Zubeyde Zumrut diyar kir ku ji bo çareserkirina pirsgirêka gelê kurd ji aliyê 300 kesayetên navdar ve deklerasyon hat destpêkirin û got, “Hemû cîhan dizane ku muxatabê pirsgirêka kurd Rêber Apo ye, ji bo ku pirsgirêka kurd bê çareserkirin pêwîste azadiya fîzîkî a Rêber Apo pêk were.”

**Amara Baran/Qamişlo**

Ji bo çareserkirina pirsgirêka gelê kurd ji aliyê 300 kesayetên navdar ku nav de nivîskar, rewşenbîr, hiqûqnas û parêzvan hene, deklarsyon hat destpêkirin. Derbarê mijarê de Hevseroka KCDK-E Zubeyde Zumrut ji rojname ya me re axivî.

**Li hemberî şer deklersyona aştiyê**

Zubeyde di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Ji bo çareseriya pirsgirêka kurd, herwiha bidawîanînan şerên ku li Rojhilata Navîn rû didin, ji aliyê 300 kesayetên navdar ve deklerasyon hat destpêkirin û banga aştiyê hat kirin. Ev kesên ku cihê xwe tê de girtine, ew kesên ku hatine surgunkirin û li Awropayê dijîn. Rûxmê hemû bangawaziyan hê jî tu hewldan û gavên şênber nehatine avêtin û dijberî vê yekê gav tên avêtin û wiha cih da deklerasoynê: “Geşedanên dawî gotinên ‘Bêyî pêvajo dest pê bike bi dawî bû” didin gotin. Li aliyekî piştî hevdîtina malbatê cezayên dîsîplînê hatin birîn, li aliyê din li Esenyurt, Mêrdîn, Êlih û Xalfetiyê qeyûm tayînî şaredariyan kirin.

Lê tevî her tiştî em dixwazin pirsgirêka kurd bi rêya aştî û demokratîk çareser bibe. Em dixwazin muzakere rê li pêşiya aştiyek mayinde û çareeseriyek demokratîk veke. Ji bo çareseriyê em dixwazin hemû aliyên ku aştî û çareseriyê dixwazin tev li vê pêvajoyê û hewldanê bêne kirin. Em dixwazin tev bibin aktorên çareseriya aştî û demokratîk.”

**‘AKP-MHP jî dizanin ku muxatib li gireva Îmraliyê ye’**

Zûbeyde wiha domand: “Di heman dema ku AKP û MHP’ê daxuyanî da, li meclisa Tirkiyê jî destdirêjî li şandeya DEM Partiyê hat kirin. Di heman hefteyê de qayûm avetin li ser îradeya gelê kurd. Ji xwe dîsa tasfiyekirina îradeya gelan û tasfiyekirina çand û nasnameya gelan e, ji ber wî jî kesên ku îro tundiyê li hemberî gelê Bakur û li çar parçeyên Kurdistanê dewam dike, kesên aşitîxwaz û kesên ku dixwazin pirsgirêka kurd were çareserkirin ew jî kesên ku îro di surgunê de ne wek siyasêtmedar, nivîskar, akademisyen, rojnamevan, hiquqnas, parezvan û hwd. Gelek kesên ku li hemberî dewleta Tirk a dagirker gotina “aşitiyê “ kar anîbûn hatibûn surgunkirin, rojnamevanên ku bi pênûsa xwe behsa aşitiyê kiribûN, siyasetmedarê ku behsa welat demokratîk û aşitiyekî mayende li Rojhilata Navîn û KurdIstanê pêk bê ku pirsgirêka kurd bê çareserkirin li hemberê erîşên faşîzma Tirkiyê sekinin û gotina xwe gotin ji ber wî jî bi sedan kes hatin surgunkirin.”

**Ji bo aşitîyek mayînde 300 kesên navdar tevlî deklerasyonê bûn**

Zubeyde da zanîn ku ev deklerasyon ji bo aşîtiyek mayînde ku li Rojhilata Navîn pirsgirêka kurd bê çareserekirin li ser vî esase ev daxuyanî ji aliye 300 kesî ve hat dayîn û wiha got: “Hemû cîhan jî dizane ku muxatabê pirsgirêka kurd Rêber Apo ye, ji bo ku pirsgirêka kurd bê çareserkirin pêwîste tecrîd bê şikandin û azadiya fîzîkî a Rêber Apo pêk were. Dewleta Tirk roj bi roj tecrîdê giran dike li kêleka wî ji rojanê êriş li ser gelê kurd pêk tînin. Îro herkese ku li hemberê şer û qirkirinê disekine dibînin ku muxatap ev 26 salin ku li gireva Îmraliyê hatiye dîlgirtin li hemberê wî pêvajoyê pêwîstî bi deklerasyonekî wiha hat dîtin û bangawazî li netew û dewletan hat kirin. Dewleta Tirk li hemberê gelan şerê bê exlaq dide meşandin li ser vî esasê bangawazî hat kirin.

**‘Çalakiyên me her û her bidomin’**

Hevseroka KCDK-E Zubeyde Zumrut axaftina xwe wiha qedand: “Gelek caran daxuyaniyê bi vî renge û bi haman naverokê hatin dayîn, lê dewletên navnetewî û dewleta tirk jî tu caran guh nedan bandgawaziyên çareserkirina pirsgirêka kurd, ji bo ku tevahî gelên Rojhilata Navîn bi jiyanekî hevbeş bi hev re jiyan bikin bi çand nasname û zimanê xwe jiyan bikin ev pir zêde nehat dîqatkirin. Ji bo bersivdayinê ne dewletên navnetewî ne jî dewleta Tirkiyê di vî warê de ji bo çarseriya mirovahiyê bersiv nedan. Emê li hember şer, qirkirin û hemû polîtîkayên qirêj bi israrbin û di berxwedaniya xwe de gav paşda neavêjin. Ev kesên ku di deklerasyonê de cîh digrin û îmze avêtine parastina aşitiyê û demokrasiye dikin bi nivîsên xwe bi gotin û peyvên xwe li hemberê şer disekinin û tînin ziman ku ew ê bi pênûs û seknaxwe ya aşitî xwez demokrasiye biparêzin ku heta dewletên nav netew û dewleta tirk bersivek bide ewê dem bi dem çalakiyên bi vî renge bên li darxistin.”



# Bila kurd bê çek bin?

**Mihemed Seydi**

Gotineke bav û kalên Kurdan heye ku ji bo dewleta Tirk dibêjin, Dewleta Tirk Ker be jî lê siwar neyên”. Dema ev gotin ji devê Kurdan derdikeve, ji ber ew vê dewletê û çavkaniya wan baş nas dikin.

Dewleta Tirk di van 10 salên dawî û bi taybet piştî têkbirina pêvajoya aştiyê ya bi rêber Apo re, siyaseta zextê li ser hemû welat û dewletên bandora wê li ser siyaseta herêmê heye da meşandin. Ev rewşa zextê, bi taybet piştî têkbirina DAIŞ ku dewleta Tirk dixwest planên xwe yên kontrolkirina herêmê bi wê bi cih bîne, qewimî. Bi taybet jî plana ku Erdogan digot “ Kobanê ket û ha dikeve”. Bi têkbirina DAIŞ’ê li Kobanê, dewleta Tirk pêvajoya danûstandinê li gel Abdullah Ocalan têk bir, bi welatên Kendavê û bi taybet bi Erebistana Siudiyê re ket nava aloziyê, bi Rûsiya re kirîza xistina balafira wan û dîsa bi destwerdanên li Misir û Lîbiya ku dor lê teng bû. Pişt dît ku bi sirtenboziya siyaset nameşe,



vê carê çû ber lingê Putin û jê lêborîn xwest û wiha pêvajo heta demekê bir. Paşê xwest bi siyaseta peywendiyên baş ên li gel Rûsiya, zextê li Ewrûpa û DYA jî bike da rê li pêşiyê vekin ku li herêmê bibe serwerê yekem. Ev siyaseta dewleta tirk dîsa heta demekê kulek meşiya, lê bi zelalbûna rewşa heyî li herêma derdora derya Sipî, êdî seqet ma.

Lê ev seqetî ji ku tê û çi sebebe ku dewleta Tirk di siyaseta xwe de ewqas tengav bûye?

Di vê dema halî hazir de, dewleta Tirk tenê hebûn û siyaseta Kurdan li herêmê ji xwe re çavkaniya têkçûnê dibîne. Ji ber wê, piştî hatina serokê DYA Baidin û heta berî wê di serdema Tramp de, zêde kete tevgerê ku Rêveberiya Xweser û siyaseta Kurd li Rojava bi taybet nemîne. Lê dema DYA ev siyaseta wan qebûl nekir, vê carê berê xwe da Rûsiya û xwest wan û Esed li hev bîne. Bi hevdîtina di navbera Erdogan û Esed, dewleta Tirk dikare dîsa zextê li Amerîka bike û bibêje yan hûnê rê bidin ku ez bikevim herêmên Kurdan an jî ez ê bi rêjîmê re li hev bikim û siyaseta we tengav bikim. Lê Amerîka û Ewrûpa bi zelalî ji Tirkan re gotin; ew hevdîtinên ku hebûna Esed rewa bikin qebûl nakin û divê biryara NY ya 2254 bi cih bê. Li aliyê din, Beşar El-Esed jî bi israr xwest ku dewleta Tirk ji axa Sûriyê ya dagirkiriye derkeve û paşê ew dikarin bi wan re hevdîtinekê bikin. Herwiha her cara Erdogan bang li Esed dikir da ew bi hev re rûnên, bi zelalî jê dixwest ku ew alîkariya hev bikin da Rêveberiya Xweser û QSD’ê têk bibin. Lê ev jî nebû û hemû derî li wan hatin girtin. Lewra careke din mijara hevdîtinên bi rêber Apo re û pêvajoyeke nû ya bi Kurdan re xistin rojevê. Ev pêvajo çiqasî ji dile û pişt berdeya wê çi heye, em nizanin û tiştek nehatiye gotin. PKK’ê eşkere kir ku tiştek ji wan re nehatiye gotin û aliyên DEM partî jî bêyî ku bibêjin, siyaseta dewletê ya zextê niyeta li hember Kurdan raxist ber çavan. Li aliyekî dewleta Tirk û Bahçelî qale siyaseta lihevhatinê bi kurdan re dikin, li aliyê din Rojava tê bombebarankirin. Dibêjin ew û kurdan bira ne, şaredariyên wan qeyûman davêjin ser û bi sedan polîsan dor li çalakiyên wan digrin. Tevî van hemû êrişan jî derdikevin dibêjin bila çekan deyînin em li hev werin. Gelo wê çi lihevhatin be ger hêza Kurdan nebe? Ev hêz heye û ewqas êriş dikin, ger hêz nebe wê demê wê bi komî qir bikin.

Li gorî ku mirov bala xwe dide gotinên Erdogan ên ku di 27’ê mijdarê de kirî ku dibêje ji PKK’ê re dibêje çekên xwe deyînin û pêşiya we vedibe. Dewleta Tirk û Erdogan wê pêşiya PKK’ê ya çi vekin ger hêza wê nebe? Ya balkêş bi vê axaftina Erdogan re, serokê PDK’ê Mesud Berzanî jî bang li PKK’ê dike ku dest ji çekan berdin. Ger Erdogan vê bangê li PKK’ê dike lê ji Rojava ji bilî xwe radest bikin çi dixwaze?

Lê gelo di rojhilata Navîn, di cihê alozî û şer de, miletekî artêş û çekên wî nebin, ew ê çi were serê wî? Gelo Mesud Berzanî ji bîr kir ku dema DAIŞ’ê hat û gihîşt sînorê Hewlêrê? Ger di destê zarokên Şengalê de di sala 2014’an de çek hebûna ew ê ev qirkirin pêk hatiba? Mirov ji bangên Erdogan fêm dike ku ew dixwaze kurdan qir bike lê serokê PDK’ê çi dixwaze ku vê bangê dike?

Herwiha dewleta Tirk li aliyekî dibêje ka werin em meselê çareser bikin û çekan deyînin, li aliyê din wezîrê wê yê parastinê Yaşar Guler daxuyaniyê dide ku wan li Zapê kilît girtine. Yanî qaşo cihê ku plan kirine dagirkirine. Dîsa dibe ku ev qaşo pêvajoya dewleta Tirk bi Kurdan re, mesajek be ji bo Esed a dibêje, ger tu neyê û bi me re li dijî Kurdan li hev nekî, em dikarin bi kurdan re lihev bikin û Sûriyê jî parçe bikin. Yanî ev daxuyaniyên wan ên ji bo destpêkirina pêvajoyê di pişt vê armancê de ye. Lê roj li pêşiya me ne ku em binêrin plan çiye.

# Ahmet Turk: Li hemberî dizî û gendeliya qeyûman 'Berxwedan Jiyane'

Hevserokê Şaredariya bajarê mezin yê Mêrdînê Ahmet Turk da xuyakirin ku polîtîkaya qeyûman desteserkirina vîna gel e û wiha got "Di dijî desteserkirina şaredariyên gelê kurd tenê rêya çareseriyê berxwedan û têkoşîn e."

**Zindan Şoreş/Qamişlo**

Di derbarê avêtina qeyûman li ser şaredariyên DEM Partî yên Bakurê Kurdistanê û hin bajarên Tirkiyê jî, di heman demê de li ser nerazîbûna li dijî polîtîkaya qeyûman û serhildanên gel, Hevserokê Şaredariya Bajarê Mezin yê Mêrdînê Ahmet Turk pirsên rojnameya me bersivandin û naveroka hevpeyvînê wiha bû:



**-Polîtîkaya qeyûman ya dewleta Tirk ya dagirker hûn çawa dinirxînin?**

Polîtîkaya qeyûman di serî de radestgirtina vîna gel e. Di heman demê de darbeyeke li hiqûq û demokrasiyê ye. Lewma jî bi tu awayî nayê pejirandin û ne rewa ye. Di heman demê de bi polîtîkaya qeyûman armanc ew e ku gel ji hemû mafên xwe bêpar bê hiştin. Talana li çandê, ziman, xizmet û dîrokê ye. Ya ku bi qeyûman dikin ferzkirina yek zimanî, yek çand, ji holê rakirina dîroka gel û baweriyan e. Ev sed salin ku polîtîkayên tunekirin û tunehesibandinê pêş dixin û nikarin encamekê bigirin, ev demeke bi rê û rêbazên cuda yên wekî tayînkirina qeyûman hewl didin van polîtîkayan bi ser bixin. Di heman demê de talan û wêrane. Hemû destkeftinên civakê ji bo derdorekê bi kar tînin. Bi qeyûman diziyê pêş dixin, xizmetekê jî ji bo civakê nakin. Bêguman ev rewş nayê qebûlkirin. Ne em qebûl dikin û ne jî gelê me vê yekê qebûl dike. Herwiha di warê hiqûq de jî em dikarin bêjin binpêkirina mafê bijartî û hilbijêran e. Em ji demên berê jî baş dizanin ku van qeyûman çi kir û çi nekir. Bi dizî û gendeliyan nirxên civakê binpê kirin. Bi qasî serê derziyê jî xizmetek ji civakê re nekirin. Di ser de deynên mezin xistin stuyên me ku em nikaribin ji bin rabin û xizmetekê ji gelê xwe re bikin. Gelê me jî van kiryarên wan baş dizan e. Dema em hatin ser kar me yek bi yek van kiryarên wan bi raya giştî re parve kir. A rast hêvî û bendewariya gelê me ji me hebû lê hemû hêviyên gelê me jî şikandin. Ev neheqiyeke mezin e. Tenê ev neheqî li dijî gelê kurd pêk nehatiye, di heman demê de li dijî gelê me yê ereb, suryan û gelê tirk jî ev neheqî pêk hatiye.

**-Serlêdana Ahmet Davûdoglu û Ozgur Ozel hûn çawa dinirxînin? Helwesta muxaleftê hûn çawa dibînin?**

Li dijî van polîtîkayên tunekirin û tunehesibandinê yên bêhiqûqî û antî demokratîk em girîngiyê didin helwesta ku yên aligirê çareserî yê. Heke li cihekî ji aliyê desthilatiyê ve neheqiyek were kirin divê tu kes serî ne tewîn e. Dibe gelê me û raya giştî bertekên herî tûj bi de dagirkeran. Hem Serokê Giştî yê CHP'ê Ozgur Ozel û hem jî Serokê Giştî yê Partiya Gelecekê (Pêşerojê) li dijî tayînkirina qeyûman helwesta xwe nîşan dan. Serdanên wan jî di vê çarçoveyê de bû. Em her tim vê dibêjin li dijî binpêkirina mafan û bêhiqûqiyê pêwîste her kes helwest û nerazîbûna xwe bide nîşandan. Îro desthilatiya AKP-MHP'ê şaredarîyên Kurdan dagir dike, sibê dê yên weke van ne fikirin hemûyan desteser bike, lewma jî em helwesta muxalefetê di cih de dibînin.

**-Berxwedana gel ya dijî qayûman di çi astê daye?**

Gelê me bi dehan salin ku li dijî her polîtîkayên dewletê tekoşîn dike û li berxwe dide. Bi dirûşmeya "Berxwedan Jiyan e" tev diger e. Em vê yekê baş dizanin, heke berxwedana gelê me raweste dê pêşiya dagirkeran zêdetir vebe. Ji xwe hemû polîtîkayên wan li ser qirkirina gelê Kurd e. Helandina gelê Kurd di her alî de xwera wek erk dibînin. Lewma jî ji derweyî berxwedan û serhildanê tu rêyeke din a gelê me tune ye. Lê ev jî heye desthilat bi taybetî jî hewl dide vîna gelê me yê berxwedêr bişkîne û radestiyê ferz dike. Lê belê gelê Kurd wekî duh ku çawa li dîjî hemû polîtîkayên wan ên tunekirin û tûnehesibandinê ranewestiya, serî netewand, îro jî dê raneweste, serî netewîn e û radest nabe. Em vê yekê baş dizanin û berxwedana gelê me pîroz e.

**-Ji bo bidawîkirina polîtîkaya qeyûman divê çi were kirin? Erka dikeve li ser milê raya giştî çi ye?**

Em di wê baweriyê de ne ku heke li dijî van polîtîkayan hemû beşên civakê, sazî û rêxistinên cîvakî, partiyên siyasî xwedî helwesteke xurt be, dagirker bi ti awahî nikarin çi şaredarîyên din desteser bikin. Divê her kesên xwedî aşitîxwaz wan kiryaran nje pejirîne û bertekên tund bidin xuyakirin. Çi di warê hiqûqî û çi jî di warê siyasî de de divê helwestek tund hebe. Gel û civak divê bi tu awayî hebûna qeyûman nepejirînin. Bi taybetî jî hilbijêrên me yên ku vîna wan hatiye desteserkirin divê hemû mafên xwe yên hiqûqî û yên demokratîk bi kar bîne. Lewra dagirkirina şaredariyan bi xwe jî ne hiqûqî ye, siyasî ye. Ji ber vê yekê pêwîst e her kes xwedî helwest be. Dema em bala xwe didinê hilbijartin mafê her kesî ye. Mafê hilbijartinê mafekî xwezayi ye û wek her aliyê civakê gelê Kurd jî xwedî wê mafê ne. Yan dê bê ser bikeve yan jî dê têk biçe. Ev mafekî demokratîk e. Lê divê mirov rêzê ji kesên ku tên hilbijartin nîşan bide. Îro ya ku desthilatî dike bêrêziyeke mezin e li dîjî gelê me. Em bi tu awayî vê bêrêziyê napejirînin û em ê hertim hemberî dizî û gendeliya qayûman berxwe bidin.

# Armanca Radiyoya Dirbêsiyê gihandina dengê rastiyê ye

**Ayşa Silêman/ Qamişlo**

**Rêveberiya Radiyoya Dirbêsiyê FM Rîhan Hesen diyar kir ku Radiyoya Dirbêsiyê 1'ê Çile di sala 2016'an ve hatiye damezrandin, radyoya xwe li ser felsefeya Rêber Apo dide avakirin. Armanc ji damezrandina radiyoyê derxistina dengê rastiyê, azadiya jin û meşandina Netewa Demokratîk e.**

Radiyoya Dirbêsiyê li ser asta Dirbêsiyê û gundewarên wê ye pêla wê 108'e. Hijmara karmendên radiyoyê 12 kesin 6 jin û 6 xortin. Her yek ji wan bernameyek wan ya taybet heye û her yek bi rengekî cuda pêşkêş dike. Radiyoya bernameyên civakî, jin, zarok, siyasî, bîrdozî pêşkêş dike. Di heman demê de guhdide bûyerên lezgîn jî da ku guhdarên wan ji her tiştî re agahdar bin. Radiyo ji seat 6 û nîvê sibehê heya 12'ê êvarî weşana xwe bi rengekî zindî dike. Di derbarê kar û xebatên Radiyoya Dirbêsiyê ji destpêka avabûna wê heya roja îro Rêveberiya Radiyoya Dirbêsiyê FM Rîhan Hesen ji rojnameya me re axivî.

**Kar û xebatê Radiyoya Dirbêsiyê**

Rîhan Hesen diyar kir ku ji destpêka avabûna Radiyoyê heta roja îro herî zêde weşan bal dikşîne li ser dozên jinan, mijarên Siyasî, civakî, hunerî, zarok, bîrdozî, xizmetguzarî û wiha got: "Radiyoya Dirbêsiyê ne tenê xwe di aliyekî de daye avakirin. Lê berûvajî wê hemû beşan digre nava xwe. Bi taybet di aliyê jinê de herî zêde xwe dide pêş û bernameyên jin di milê bîrdozî de tên pêşkêş kirin. Armanca me ji girtina hemû aliyên jiyanê ew e ku em hertiştî ji guhdaran re pêşkêş bikin. Seatên destpêkirina bernameya radiyoyê ji seat 6 û nîvê sibehê heyanî 12'ê êvarî zindî weşana xwe dike. Bernameya me bi sirûda Ey Reqîb destpê dike. Bernameya Rojbaş ji seat 8 û nîv dest pê dike heya 11'an, ji guhdaran re him quncik nivîsan, him jî mijarên ku rojane diqewimin çi civakî, siyasî û bîrdozî bi guhdaran re parvedike.

Bernameya Analîza Rojê heye têde çi bûyerên ku di rojê de qewimîne ji guhdaran re tê pêşkêş kirin. Bernameya siyasî, bîrdozî jî heye. Herwiha bernameya taybet girêdayî jin û siyasetê jî heye, ev şîrove dike ku rojane çi siyaset li ser jinê tê meşandin û li hemberî wê sekna jinê û têkoşîna wê li hemberî vê yekê. Her wiha bernameya taybet girêdayî jin û bîrdozî û cihê jinê di nava civakê de heye. Bernameya me ya pêşbirkê jî heye, kesên ku tevlî pêşbirkê dibin û bi ser dikevin diyariyê digrin. Bernameya zarokan, zarok têde cihê xwe digrin him staran û him jî çîrokan dibêjin. Di heman demê de bernameyên me yên ciwanan jî heye têde nêrîn, helwest, kar û xebatên ciwanan tê dayîn. Radiyoya Dirbêsiyê bû cihê perwerdeyê ji gelek kesên ku Ji 2016'an heya roja îro ku tevlî xebatê wê bûn. Ev radiyo ji bo wan bû wek dibistanekî, ji ber ku piraniya kesên ku cihê xwe di vir de digirtin niha cihê xwe di gelek kar û xebatên din yên ragihandinê de digirin."

**Astengiyên kar û xebatên ku têne meşandin**

Rîhan Hesen da zanîn ku tu astengiyên mezin bi wan re derneketine, ji ber ku ew û gelê dirbêsiyê yek destin û wiha got: "Hertim em ji bo rexne û pirsgirêkên wan re vekirîne loma rehetiyek li cem wan avabûye û hertim bi me re dibin alîkar. Tenê astengiya ku em dibînin ew jî di milê malpêra me de bû, ji ber ku dewleta Tirk hertim dixwest vexumandinê li ser pêla me bike. Ji ber ku bajarê Dirbêsiyê nêzî sînore. Ji sala 2016'an ve heya niha gelek pêlên weşana radyoyên me hatin girtin, ji ber ku dagirkeriya tirk naxwaze dengê rastî û heqîqetê bighêje gel. Raste em radiyoyeke xwecihî ne lê em hemû bûyerên ku li cîhanê diqewimin ji guhdaran re pêşkêş dikin. Di heman demê de di milê guhdarên me de hin astengî derdiketin ew jî ku pêla me dengê wê baş nedigiha wan, lê ev yek nebû pirsgirêk di pêşiya me de ku em dev ji karê xwe berdin. Vexumandina dijmin ji pêla me re tucarî nikarîbû israr û hêviya me qutbike. Radiyoya me netenê pêl e, di heman demê de malpêra me li ser enternêtê jî heye ji bo kesên ku li me guhdar dikin û tevlî bernamyên me dibin."



Rêveberiya Radiyoya Dirbêsiyê FM Rîhan Hesen di dawiya axaftinên xwe de got: "Hêviya min ew e ku di demên pêş de em radiyoya dengê rastî û heqîqetê bêtir li pêş bixin. Pilansaziyên ku em dixwazin di dema pêş de bikin ew e ku di milê azadiya jin de hîn bêhtir xebatan bidin meşandin da ku jin bighêje azadiya xwe. Her wiha derfetê bidin herkesê ku dixwaze di riya radiyoya me re xwe perwerde bike."



## 46 Salî me!

**Ahmet Aktaş**

Bêgûman sedema ez temenê xwe wisa nîşan didim heye.
Li goreyî saziya serjimarê, ez 72 salî me. Lê li goreyî rastiya min, temenê min 46 e.
Ji ber ku ez wan 26 salan, bê wate û weke ne jiya bim dijmêrim.
Rastiya jiyana min a bi wate û bi armanc, bi naskirina Rêber Apo re ya 1975a despê kiriye û bi avakirina PKKê re, ya sala 1978an re dewam kiriye û heta axîretê dom dike.
Lewma salvegera Tevgêra bi rûmet û dîrokî, weke salvegera rojbûna xwe dibînin û ji bo îsal dibêjim "ez bûme 46 salî"!
Îca li goreyî min, ne ez an takekesên din bi tinê, belê ev gotin ji bo gelê me û cîhanê jî derbas dar e, jiber ku heta nuha, ne gelê me û ne jî yên cîhanê, ne bûye xwediyê Rêberiyek û Tevgêrek wisa ji aliyê zanistî, bîrdozî û siyasî ya hemdemî têr û tije.
Erê di dîroka gelê me û yên cîhanê de gelek rêber û tevgêr derketin e, gelek berxwedanên lehengî û hêja jî pêkanîne, lê ne di vê radeya bilind û mezin de bûn.
Lewma temenê wan kurt bûn û di encamê de ji aliyê desthilatiyan ve hatin hilweşandin.
Ma dewelata tirk, ji bo doza gelê me ne gotibû, "me kuşt, xist binê çiyayê Gilîlê/Agiriyê û me ser beton kir", ev jî tê wateya ku êdî nikare zindî bibe.
Lê belê Rêber APO, him van fermanên dewleta qirker, li wan zîvirand û him gelê me ji wê xewa mirinê şiyar kir, rakir ser piya û dîrokek nuh a zindî ya zanistî da despê kirin û heta îro jî ev meşa azadkirina welat û gelê me bê navber, bi hemû heybeta xwe, 47 sale dewam dike û serdikeve.
Heke mirov karibe bi çend hevokan naveroka cewherê dîroka vî Rêberî û vê Tevgêrê ya 46 salan dest nîşan bike, dikare bêje "erê ez jî hinek şopdarê vê Tevgêrê û vê Rêberiyê me"!
Rêber APO, di despêkê de, biryara bingehîn da ku ji derveyî sistema dewletê xebatê bide meşandin. Gava yekê ya vê biryarê, di NEWROZA 1973an de li Bendava Çubuka Enqereyê avêt.
Biryarek din a bingehîn a vê Tevgêrê ku berovajî tevgêrên din jî ev bû: Pişta xwe bi tevayî spart baweriya bi xwe û hêza gelê xwe.
Her wiha li himber sistema netewdewletê, sistema xwe ya bi cewhera netewa demokratik a konfederaliya demokratik destnîşan kir.
Bi vê çarçovê, li şwûna yek dewlet, yek netew û yek û yekê, bi cewherê pir nasnameyî, pir bawerî û pir û pirî naveroka navnetewîtiyê/enternasyonalistiyê jî xurtir kir. Jixwe tê zanin, hîn di despêka tevgêrê re de bi beşdarbûna Haki û Kemal, ev cewher hebû.
Yek ji mijara sereke ya bîrdozî û felsefeya vê Tevgerê jî; mijara azadî û rola pêşeng a jinê di şoreşê û pêşxistina civakê de ye.
Ev mijar, bi dirûşma JIN JIYAN AZADÎ ya stratejîk a jinên Kurdistanê, ji nuha ve di rojeva jinên cihanê de cihê xwe standiye û sedsala 21ê dibe sedsala jinê!
Cejna 27ê Mijdarê Pîraz be!



# 'Ji bo çareseriyeke mayinde parastin pêwîst e'

Endama Desteya Serokatiya PYD'ê Foza Yûsif da diyarkirin şerê ku li Rojhilata Navîn dimeş e şerê desthiladarî û berjewendiyên mêtingera ne û di heman demê de bibîrxist ku "li hemberî wan aloziyan rêya tekane rexistinbûyin û amadekariya şerê gelê şoreşgerî ye"

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

Şerê navbera Hemas-Israîl û Israîl-Libnanê berdewam dike, bandoriyek mezin li ser giştî herêma Rojhilata Navîn dike. Di heman demê de êrîşên Israîlê gelek caran li ser baregehên hêzên çekdar yên girêdayî dewleta Îranê li ser axa Sûriyê jî berdewam e. Paytexta Sûriyê Şam jî gelek caran ji milê Israîlê ve dibe armanc. Êrişên dagirkeriya tirk bê navber li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê didomin.
Di derheqê metirsiyên li ser herêmê û geşedanên siyasî û xebatên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên siyasî, diplomasî û parastinê de, Endama Desteya Serokatiya PYD'ê Foza Yûsif ji rojnameya me re axivî.

**'Ev şere li ser herêma Rojhilata Navîn bandoriyek neyinî ava dike'**

Endama Desteya Serokatiya Partiya Yekîtiya Demokrat (PYD) Foza Yûsif da xuyakirin ku dewletên hegemon û desthiladar, navenda şerê cîhanê wek herêm Rojhilata Navîn hilbijartin e, li gor berjewendiyên xwe dimeşînin û wisa dest bi axiftina xwe kir: "Iro seranserê cîhanê şerekî mezin diqewim e. Ev alozî û gengeşîya di holê de, herî zêde bandora xwe li Rojhilata Navîn dike. Rojhilata Navîn ev 200 salin bûye navenda şerên desthiladarî û berjewendîyan. Di nav herêma Rojhilata Navîn de wek her çar beşên Kurdistanê jî şerek mezin jiyan dikin. Li Sûriyê giştî û bi taybet jî li Rojava ev nêzî 14 salin şerekî mezin di qewim e. Ji bo wê şerê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi zanebûn hatiya hilbijartin. Heya di wê herêmê de çareseriyek siyasî, danustandinên di asta ku berjewendiyên gelê Sûriyê bingeh digire neyên kirin, em nikarin qala çareseriyeke domdar bikin. Pirsgirêkên ewlekarîyê zêde bûne. Ev şerê ku li Libnanê dimeşe û di êrîşên israîlê ya li ser Îranê dide diyarkirin ku dê bandora xwe li ser axa Sûriyê giştî jî bike. Mirov dikare vê yekê bêje ku hêzên hegemon û mêtinger Sûriyê kirine xeta agir. Rojavayê Kurdistanê jî, di nava agir de cîh digir e, Sûriye wek welatên cîran nêzî sînorên Tirkiyê û Iraqê ye. Her du welat jî her hem di milê leşkerî de û di heman demê de jî desthilatiyên ku wan welatan birêve dibin siyasetên xwe yên li hemberî gelê Kurd dûrî rêyên çareseriyênê. Dewleta Tirk ya dagirker siyaseta xwe ya heyi, her tim di aliyê şer û aloziyan de bikartîne. Gefên ku Tirkiye dixwe, êrişên Israîl li ser Îranê li ser axa Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêktîne, pêwîste em wek gel û tevger ji bona şer û pevçûnên giran xwe amade bikin. Hin aliyên dewletên hegemon û mêtînger di ragihandinên xwe de, amadekariyên hêzên parastinê yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikin mijara nîqaş ê. Kesên ku wê tiştê dibêjin xeteriya li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê nabînin û êrîşên dagirkeriyê yên li ser Rojava jî diparêzin. Ger ku em hezdikin aşîtîyeke mayinde pêk were, pêwîste em xwe ji bona şer jî amade bikin. Ji ber wê yekê pêwîste ku em parastina xwe xurt bikin."


**'Ji bona parastina gelê xwe, hêzên me yên parastinê amedene'**

Foza Yûsif balkişand li ser hîma xweparastinê û axaftina xwe wisa domand: "Wek hêzên me yên ewlehî û parastinê QSD, YPJ, û HPC'ê jî, ji bona êrîşekî gengaz ji milê dagirkeriya tirk li ser gelên heremê her tim di nava amedebaşiyêdene. Raste tevgerandinek heye, lê pêwîste ev yek bê xurtkirin. Divê gelê me bi giştî piştgiriyê bidin zarokên xwe yên ku di çeperên şer de ne. Ji ber vê yekê pêwîste ku civak û gelê me wek her tim berxwedanî meşandiye, di vê pêvajoyê da jî li kêleka hêzên xwe yên parastinê cih bigre û welatê xwe bi hevre biparêzin. Pêwîste hemû welatîyên ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jiyan dikin, xwe wek şervanekî/e azadiyê bibîne û li ser vî bingehî erkê xwe pêkbîne, ji ber ku parastina rewa mafekî xwezayî ye. Êdî her welatek xwedîyê hêzên parastinê û ewlehîyê ne. Em jî wek pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ji şerê li herêma me diqewime ezmûn girt û em dikarin li hemberî her êrîş û tûndiya ku li hemberî me tê meşandin xwe biparêzin, ev yek jî bi saya felsefeya Rêber Apo ya yekîtiya gelên bindest e. Ev vîna gelê Rojava çeteyên DAIŞ'ê şikandin û êrîşên dewleta Tirk ya dagirker vale derxistin. Tevger û hêzên me bi şêwazekê pispor li ser ramanên Rêber Apo xwe perwerde dike. Pêwîste civaka me bi rihê avakirina Şoreşa Rojavayê Kurdistanê li gel hêzên xwe yên ewlekarîyê cih bigirin û xebatên parastinê bimeşînin"

**'Şerê ku li herêmê dimeşe, berjewendîyên dewletên mêtinger pêktîne'**

Foza Yûsif axaftina xwe wisa bi dawî kir: "Ev şerê ku tê meşandin şerê desthilatiya hêzên hegemon e. Israîl hewil dide, şerê xwe yê li hemberî Hizbullahê derbasî Sûriyê jî bike. Îran jî di aliyekê da bi zêdekirina hêzên çekdar yên girêdayî xwe li Sûriyê hewil dide ku nakokiyan kûrttir bike. Di demeke beriya niha de Îranê li ser baregehên DYA yên Hesekê êriş pêkanîn. Em wek gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jiyan dikin, nabin alîgirê ti kesî, ji ber ku ev şer ne diberjewendiyên gel de ye. Ev şerê ku niha dimeşe, tenê berjewendiyên dewletên dagirker bingeh digire. Lê dema ku şer li herêmê gur bû, em jî di çarçoveya şerê gelê şoreşgerî û parastina civakî de xwe biparêzin û berjewendiyên gelê me ji beriya hemû tiştî ye. Di vê mijarê de wek xebatkar û endamên Rêveberîya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê helwesta me zelal e. Metirsiyek wiha jî heye li holê dibe ku dewleta Tirk ya dagirker ji aloziyên ku hene sûd werbigire û êrîşekî li ser heremê pêkbîne. Ji ber gefên ku tên xwarin û êrîşên ku tên kirin di wê çarçoveyê den e. Dewleta Tirk ya dagirker hewil dide ku aloziyên herêmê li gorî berjewendîyên xwe bikar bîne û hewil dide çawa ku Serêkaniyê, Girê Spî û Efrîn dagirkir, Bakur û Rojhilatê Sûriyê giştî dagir bike û demografiya herêmê biguherîne. Ger ev alozî zêdetir bibin di her alî de dê bandora xwe li ser herêmên rizgarkirî jî bike. Ji ber vê yekê, welatiyên ku li bajarên Sûriyê yên di bin desthiladariya Hikûmeta Şamê de cih digire jiyan dikin dê bixwazin derbasî herêmên Rêveberîya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bibin. Ji bona ku bandoriya aloziyan li herêmên me jî nekin pêwîste ku çareserîyekî sîyasî û yekîtiya gelên heremê pêk were. Helwesta Rêveberiya xweser ji bona çareseriyê gelekî girîng û watedar e. ji ber ku Rêveberîya Xweser di yekîtiya Sûriyê de xwedî xebatekî girînge. Her car Rêveberîya Xweser daye xuyakirin ku ji bo çareserî û guftugoyê amade ye. Lê hikûmeta Şamê xwe nêzî wan nîqaşan nake û bê bersiv dihêle. Em li vir dîsa wê peyamê ji bo aliyên peywendîdar dubare dikim û em wek gelên herêmê pêwîste yekîtiya xwe xurt bikin û li hemberî hemû êrîşên siberojê yên ku diqewimin liberxwe bidin"






FENER

## Yekîtiya neteweyî tekane rêya xilasiya Sûriyê ye



**Idrîs Henan**

Komên Elqayîde (Heyet Tehrîr Elşam) Alnusra berê, DAIŞ û çeteyên girêdayî faşîzma Tirk di 27 Mijdarê de dest bi êrişeke berfireh li dijî gundewarên bakur rojavayê Helebê û gundewrên başûr Idlibê kirin. Di encamê de cografiyayeke bi qasî ya ku salên 2019an ji dest dane, dagir kirin û rêya Şam - Heleb, M5 ji nû ve birrîn. Vê yekê metirsiyek mezin li cem gelên herêmê û bi taybet şêniyên parêzgeha Helebê û taxên wê çêkir.
Di heman demê de bû sedema gelek nirxandinên siyasî û lêkolînên leşkerî. Ev êrişa han rojek piştî agirbesta li Lubnanê hatiye ragihandin pêk hat. Dêmekî derveyî pêşketinên giştî yên li herêm rû didin mirov nikare vê êrişa çeteyên Tirkiyê bigire dest.
Di vê derbarê de hinek dinirxînin ku Tirkiyê ji bo normalîzekirina têkiliyên bi Sûriyê re ev kom dehfî êrişan kiriye. Ango kartên xwe yê hêzê raberî Şamê û Rûsyayê dike. Aliyek din jî pê ve diçe û dibêje ku gengaze hevkariyek Îran û Tirkiyê be ku rê li ber lihevhatinên Sûriyê bi welatên Erban re bigirin taybet piştî Lûtkeya Erebî li Riyadê ku helwesta Sûriyê ji encamên wê erênî bûn. Herdu aliyên navborî jî ew helwesta Şamê weke darbeyek li dijî, qaşo (Eksena Berxwedanê), xwendin û bi vî awayî jî Îran zêde nêzî hevalbendê xwe yê veşartî, rasteqîn û îslamî Tirkiyê kiriye. Lew re jî ev êriş weke siza hate hesibandin.
Aliyek din jî Tikriyê baş fêm kiriye ku herêm rûbirûyî guhertinek bi kok e û dê pozisyona xwe ya berê ji dest bide, lew re jî hewl dide bi rêya êrişeke wisa pozisyonek stratejîk ya sedsaleke nû bi dest bixe û li ser hesabê parçekirina Sûriyê û tunekirina doza Kurdan xewna Mîsaqa Millî bixe jiyanê. Ji ber vê yekê bû, roja êrişan Erdogan derket û got ku ewê ji Behra Spî heya sînorên Îranê xeteke ewlekariyê ava bikin!
ji xwe Erdogan berê jî metirsiya ji wendabûna pozisyona xwe bi bangên ji Şamê re rave dikirin ku hewl dida koalisyonekê li dijî Hêzên Sûriya Demokratîk û Sîstema Rêveberiya Xweser ava bike. Lê helwest û daxwazên Şamê yên xweragirtina li dûrî şerên li herêmê rûdidin, hiştye ku navenda îslama siyasî kaxezên li herêmê li hev bixîne ku bermahiyên baskê Şî`î û baskê Sunî yên wê navendê werin parastin. Lew re jî gelek nirxandinên ku dibêjin 27 Mijdra Alnusra û Tirkiyê dê encamên 7 Cotmeha Hemas û helwesta Hîzbullahê Lubnanî bi xwe re bîne. Ango piştî ku baskê bi hêz ê Şî`î li herêmê hate şikandin, îcar dor li baskê Sunî yê Alnusra û bermahiyên DAIŞ yên di hembêza Tirkiyê de mezin dibin de ye.
Ji lêkolîn û nirxandinên cuda cuda wêdetir, carek din sedemên bingehîn ên kirîza li Sûriyê û herêmê xwe didin der. Her wiha isbat bû ku çi lihevkirinên derveyî îradeya hêzên demokrasiyê li Sûriyê çêbûne, diherifin û hildiweşin. Yanê çi tişta navê xwe Astana û herêmên kêm şer bi vê êrişê re rewatiya xwe ji dest dan. Her wiha cara sedemîn e ku isbat dibe Tirkiyê û mirûdên wê li pey aloziya li Sûriyê û herêmê ne. Çendîn bê helwestek rasterast be jî, lê her kes dizane ne bi fermana Tirkiyê ba, ti hêzên çeteyan nikarin biryara êrişan bigirin. Cara milyonî ye jî isbat dibe ku yekparebûna axa Sûriyê ancax bi lihevkirina bi hêzên demokrasiyê re pêkan be. Pêvajoya kirîza kor û dirêj û şerê qirêj ê li Sûriyê rû dide, bi dirêjahiya salan tivî kiriye ku tekane rêya xilasiyê lihevkirina hundirîn û kombûna li dora maseya neteweyî ya bi çandên li Sûriyê re ye.